



Bêhestkirina taybetcihî ji bo emeliyata çavê te

Ev belavok diyar dike ka tû çî hêvî bike dema ku tû di bin bandora Bêhestîya taybetcihî de be wextê emeliyatê. Ew ji alîyên bijîşkên bêhestkirinê, nexweş û nûnerên nexweşan ku bi hev re dixebitin hatîye nivîsandin.

Bêhetkirina taybetcihî ji bo emeliyata çav.

Bêhetkarîya taybetcihî dermaneke ku êşa te radwestîne Ji bo emeliyata çav, ew dikare wekî **dilopên çavan** û/yan derzî were dayîn. Piştî ku tû di bin Bêhetkarîya taybetcihî de be, tû hînî şiyar dimîne û haya te wê hebe ji tiştê ku li dora te çêdibin. Armanc eve ku tû di dema emeliyatê de ti êşê hest neke.

Başîyên bêhestkirina taybetcihî çine?

Bêhetkarîya taybetcihî zor caran baş dixebite ku nehêle tû ti êşê hestbike di dema emeliyata çav de. Ew jî:

- Êşa ku piştî emeliyatê bi çend saetan sevik dike.
- zor caran ji bêhetkarîya gişî xeter û bandorên wê kêmtire, bi taybetî ku tû pîr be.
- piştî emeliyatê başbûnek zûtir gengaz dike, ji ber vê yekê tû dikare bi piranî di heman rojê de biçê malê.
- Mecalê dide te ku hûn piraniya dermanên xweyên normal bidomîne.
- Mecalê dide te ku tû bi serbesî bixwe û vexwe ji bêhetkarîya gişî - karmendên nexweşxaneyê dê di derbarê vê yekê de ji te re şîret bikin.

Gelo ez dikaim hîlbijartina bêhetkarîya gişî bikim?

- Erê. Tiştek bi te nayê heya ku tû tiştên ku ji bo te hatine plansaz kirin fam neke û bipejirîne. .
- Heke tû ji bo bêhetkarîya gişî bêtir hez dike, divê tû vê yekê bi zûtîrîn dem de bi anesthetist an bijîşkê xwe re nîqaş bike. Mimkine sedemek bijîjkî hebe ku çima bêhetkarîya gişî nayê pêşniyar kirin. Mimkine tûn hewce be ku demeka dirêjtir li benda emeliyata xwe bisekine, ji ber ku navnîşên benda ji bo emeliyata di binê bêhetkarîya gişî de dirêjtir dibe. Dibe ku hin nexweşxane nikaribin di bin bêhetkarîya gişî de emeliyatan peyda bikin.

Bêhestkirna taybetcihî çawa tê bikar anîn?

Du cure yên Bêhestkirna taybetcihî hene:

- hin emeliyat dilopên çavan bikar tînin yê ku çav bêhest dîkin. Derzî ne hewce ne. Birînsazê te wê karibe ji te re vebêje ka gelo ev ji bo cureya emeliyata te mimkun e.
- Gelek emeliyatan derziyek Bêhetkarîya taybetcihî hewce dike Ev tê de emeliyatên ku çav divê pir bêdeng bimînin - mînakî emeliyatên li ser tora çav. Pêştir dilopên çav têne dayîn, da ku rûyê çav bêhest bike. Dûv re derziyek li nêzîkê çavê (lê ne di koka çavê xwe de) tê dayîn.

Gelo derziya Bêhetkarîya taybetcihî diêşe?

Ev ji kesekî heta kesek din diguhere. Dilopên çavan ku rûyê çav bêhest dîkin pêşî têne bikar anîn da ku ew heya ku gengaz be rehet bikin. Derziyek pir zirav tê bikar anîn û dibe ku hestek tûjbûn an zextê hebe, ku bi piranî ji deqeyek kêmtir dimîne.

Ma her kes dikare Bêhetkarîya taybetcihî hildibijêre jo bo emeliyata çav?

Na. Ji bo ku emeliyata te bi selameti Bêhetkarîya taybetcihî bikar bêne, tû hewcî bi:

- bi awayek rast û bêtevger heta 45-60 deqeyan xwe palde.
- talîmatên hesan bişopîne.

Bêhetkarîya taybetcihî bara pitir nayê pêşniyar kirin ger tû:

- alerjiya naskirî ji Bêhetkarîya taybetcihî re heye
- nikare rast xwe dirêj bike
- Zehmet an ne mumkun e ku tû bêtevger bimîne, mînak nexweşiya Parkinson
- Zehmet e ku tû bibîr bîne ka çi diqewime, wek mînak dînbûna sivik.
- kuxikek hebe ku tû nikare kontrol bike
- zehmetiyên bihîstinê yê giran hene
- Zehmet fehm bike tiştên ku têne gotin.
- Gelek tirsaa te hebe ji cihên girfî an teng.

Ger yek ji van ji bo te derbasdar be, emeliyatker wê vebijarkan bi bijîjkê Bêhestkirnê yê te re nîqaş bike, lê Bêhetkarîya gişfî wê werê berçav kirin..

Kî Bêhetkarîya taybetcihî bi rêve dibe?

Hem bijîjkê Bêhestkirnê û hem jî bijîjkên çav têne perwerdekirin ku Bêhetkarîya taybetcihî birêve bibin.

Ma tevliheviyên Bêhetkarîya taybetcihî hene?

Ji bo gelek kesan Bêhetkarîya taybetcihî ji bo emeliyata çav vebijarka herî ewledar e. Mimkine cihê birînan an reşbûnê li dora li dora çavê te çêbibin, ji ber ku derzî zirarê piçûk dide damarê xwînê ya li dora çav. Ev bi piranî ne ciddî ye lê dikare hefteyek an wusa nebaş xuya bike. Ev pir gelemperî ye eger tû aspîrîn an dermanên din ên ku xwînê sivik dîkin bixwe..

Kêm caran, xwîna pişfî derzîlêdanê dibe sedema pirsgirêkên li dora çav. Dibe ku bijîjkê te biryar bide ku emeliyat dê rojek din were paşve xistin.

tevlîheviyên giran

Xetereya zirara girîng a çavê te ku bandorê li dîtina te, damarên xwînê an masûlkeyên çav dike, 1 ji 5,000 an kêm e (wiha tenê 1 ji her 5,000 nexweşên ku têne derman kirin bandor dibe). Kêman caran dibe ku bandorên cidî li ser dil an nefesa te hebe. Bijîjkê Bêhestkirnê û emeliyatkerê çavê te dê bikaribe di derheqê van tevlîheviyan de bêfir agahdarî bide.

Berî emeliyatê

gelek tişt hene ku tû dive xwe ji wa re hazir bike ji bo emeliyata te û heyama başbûnê eger dema emeliyata te hatiya destnîşan kirin.

- Wê çêtirîn be heger tû amadehiya heyama başbûnê ya li malê berî demekê bike û ji dost û malbata xwe re bêje ka ew ê çawa ji te re bibin alîkar. Divê tû bifikire tû ê çi bixwe û heger tû hewce ne ku li malê guhartineke çêke da ku başbûna te hêsantir bike.
- Heger tû di eynî rojê de piştî bikaranîna Bêhetkarîya taybetçihî an hedarbûnê vegere li malê, divê tû yekê/î mezin û berpirsiyar bibîne ku te bi erebe an taksiyê bibe li malê û heya 24 saetan li cem we bimîne. Agahiyên ji bo kesên ku lînêrîna kesekî/a ku nesaxiya giştî an hedarbûnê girtiye, di belavoka me de têne dîtin Lînêrîna kesekî/a ku Bêhetkarîya giştî yan hedarbûnê kiriye: www.rcoa.ac.uk/patientinfo/sedation
- Ji bo agahdariya li ser amadekirina ji bo emeliyata tarîbûna nîşkiya çav, ji kerema xwe li belavoka me binihêre li ser amadekirina ji bo emeliyata tarîbûna nîşkiya çav ya ku li ser malpera me tê dîtin: www.rcoa.ac.uk/patientinfo

Kilînkî nixandinê ya pêş-emeliyatê

Dema ku roja emeliyatê tê hat destnîşan kirin, pêdivî ye ku pişkinîna tenduristiyê were kirin. Dibe ku ji te re pirsnameyek kurt a tenduristiya te were şandin an ji te were xwestin ku tû beşdarî klînîkek nixandina pêş -emeliyatê bibe. Kilînkî nixandinê ya pêş-emeliyatê

Ew ê di derheqê Bêhetkarîya taybetçihî, derman, alerjî û asta çalakiya te de pirsên berfireh ji te bipirsin. Ger hewcedariya te bi fehsan hebe, ew ê li vê klînîkê bêne saz kirin.

Ew ê di derheqê rewşa mala te de jî ji te bipirsin da ku piştrast bikin ku piştî emeliyatê timê alîkarî jo bo te heye. Girîng e ku tû plansaz bike ka tû ê çawa piştî emeliyatê li malê xwe birêve bibe û gelo kes dikare bi te re bimîne da ku li te binêre û alîkariya te bike bi dilopên çav re. ev bi taybetî girîng e eger dîtina çavê teyê din belengaz be Her weha tû dikare cihe mobîlyayan biguhere da ku piştî emeliyatê ji te re hêsantir bibe.

Dermanên te yê gelemperî

Karmendên klînîka nixandina pêş -emeliyatê dê wê dermanên ku tû dibe tomar bikin. Ji kerema xwe navnîşeka dermanan bîne yan dermanan tevlî qutiyên wan bîne. Pêwîste ku dermanên bê raçete te kirî bin û li gel dermanên giyayî yê ku tû bikar fîne li gel xwe bîne.

Piraniya dermanan mimkine wekî berê berî emeliyatê bêne bikar anîn.. Lêbelê, hin derman an tablet divê bêne sekinandin di di heman rojê de an berê çend rojan . Dê ji

te re talîmat bê dayîn ka çî derman bi kar bîne û çî divê were sekinandin. Van rêwerzan girîng in û divê bi baldarî werin şopandin.

Ger tû clopidogrel, rivaroxaban, warfarin an dermanên din ên 'xwînê sivik dîkin'' bi kar fîne, dibe ku tû hewceyê rêwerzên taybetî yê di derbarê wan de bin. Dibe ku xetereyên rawestandina van dermanan hebin û divê tû xetereyên xwe bi şêwirmendê xwe re nîqaş bike. mimkine ku tû ne hewce be ku van dermanan ji bo emeliyata tarîbûna nîşkiya çav bidê sekinandin.

Di roja operasyonê de

Pêdivî ye ku tû rêwerzên zelal bistîne ka gelo û kengê divê tû xwarin û vexwarinê bidê sekinandin.

Heya ku tû bi rêwerzek din neyên rêve kirin, divê tû dermanên xwe yê rojane bi kar bîne.. Divê tû berî emeliyata xwe fermanên ku di derbarê xwarin û vexwarinê de tene dayîn bişopîne. tû dikare avê vexwê bi çî tabletên ku mihtacî ku tû bixwe.

Ger di roja emeliyat de kuxîn an sermayek giran hebe, divê tû telefona nexweşxanê bike ji bo şêwirmendiyê. mimkine ku hewce be ku emeliyata te were paşve xistin.

Ji kerema xwe hemî derman, tablet û bêhnkêşa pencê bi xwe re bîne da ku bijîjk û hemşîre wan binêrin.

Hevdîtina bi bijîşkê te re

Tû ji hêla emeliyatkerê çavan re werê dîtin. Ew ê seh bikin ka kîjan çav tê emeliyat kirin û bi te re emeliyatê nîqaş bikin. Wê Ji te bê xwestin ku tû forma destûrnameyê îmze bike û ew ê nîşan kin çavê ku werê emeliyat kirin.

Hevdîtin bi bijîjkê Bêhestkîrnê re

Ger bijîjkê Bêhestkîrnê bi emeliyatkerê çav re bixebite, tû wan bibîne û ew dikarin bersivê bidin pirsên ku te hene di derheqê Bêhestkîrnê de.

Û herwiha mimkine tû bi Hevkarên Bêhestkîrnê re bicive, ew kesên pisporên tenduristiyê yê baş hatine perwerdekirin. Hûn dikarin li ser rola wan û fîma Bêhestkîrnê bêtir agahî ji malpera me bigrin: www.rcoa.ac.uk/patientinfo/anaesthesia-team

Pirsên ku tû dikare ji bijîjkê Bêhestkîrnê yan ji emeliyatkerê xwe bipirse

- Wê kî bêhestkîrnê li ser min bikar bîne?
- Ma te ev cûreyê Bêhestkîrnê gelek caran bikar aniye?
- Ma pêdivî ye ku li ser min Bêhetkarîya taybetcihî were pêk anîn?
- Talûkeyên ev cûreya Bêhestkîrnê çî ne?
- Ma ezê tu talûkeyên taybet bibînim ?
- Gelo ez ê pişt re çawa bihesim?

Gelo ez dikarim tiştê bikim ku alîkariya min bike ku ez aram bibim?

Bijîşkê / a we û xebatkarên din ên di jûriya emeliyatê de pir têne bikar anîn ku dilniya bidin û alîkariya mirovan bikin ku rihet bibin. Dermanên hedarker carinan dikarin bêne bikar anîn. Lêbelê, ew dikarin di dema emeliyatê de bibin sedema pirsgirêkan ger tû ji xewê dûr bikeve û ji nişka ve şiyar bibe û tevgerê bike, an jî heke nefesa te hêdî bibe. Ji kerema xwe pirsgirêkên xwe bi anestezişt an bijîşkê xwe re nîqaş bike. Ew dikarin vebijarkên li ber destê we bi te re nîqaş bikin.

Ji bo agahiyên zêde li ser dermanên hedarkirinê, tû dikare belavoka me ya li ser hedarkirinê ku li ser malpera me berdest e bibîne: www.rcoa.ac.uk/patientinfo/sedation

Paşê çi dibe?

- Dibe ku ji te re werê xwestin ku tû kincê nexweşxaneyê li xwe bike. Hin nexweşxane destûrê didin mirovan ku kincên xwe li xwe bikin. Pêdivî ye ku tû kincên rehet ên ku li dora qirrikê vekirî ne li xwe bikin.
- Ji bo hin emeliyatan, hemşîreyek li nexweşxanê de hin dilopên çavê bide te da ku reşika çavê te fireh bike (wê mezintir bike). Dîtina wê ji bo demekê hinekî tarî bibe.
- Berî ku tû biçe jûriya emeliyatê maqûl e ku tuwaletê bikar bîne da ku tû bi rehefî paldê.
- Hemşîreyek wê bi te re bibe jûriya emeliyatê bi ereboka destan, kursiyê kûllekan an jî, ger tû bixwaze, tû dikare bimeşe.

Karmendê jûriya emeliyatê dê hin pirsan ji te bike da ku nasnameya û emeliyata te piştrast bike. Ew ê dîsa bi te re şek bikin ka kîjan çav tê emeliyat bikin û forma razîbûna te tesdîq bikin.

Li odeya Bêhestkîrnê

wê cihê teli ser trolleya emeliyatê rehet be. balifek pir caran di binê çokên te de tê danîn da ku qerimînê ji ser û piştê te rakê.

Dibe ku bijîşkê Bêhestkîrnê amûrek bijîkî bi cîh bîne ji bo çavdêriyê:

- **dilê te:** lezaqokên li ser sînga te (wêneya nîşandana kehrebî an ECG)
- **xwînpestîna te:** mimkine ku wekê kelepçek li ser milê te were xistin ji bo pîvandina xwînpestîna . Di dema emeliyatê de ev dibe ku xwînpestîna te her 5 û 15 deqeyan bipîve. Ev dihêle hestek tengbûnê di milê te de çê bibe.
- **asta oksîjenê di xwîna we de:** wê klîpek li ser tiliya te werê danîn (pulsimoksîmetre).

Wê derziyeke were bikaranîn ku boriyeke tenik û plastîk (kanûlek) di nav demarekî li pişt dest an zendê re were têxistin. Ev bi paçikek zeliqokî tê misoger kirin. Ev ji bo ku anestezişt ku dermanên tû bi hewce be bide te.

Tîma Bêhestkîrnê wê seh bikin eger navê, roja jidayikbûnê û emeliyata te durust in.

bijîşkê Bêhestkîrnê yan emeliyatkerê çav wê hingê dilopên çav û/yan derziyên ku çavê te benc dîkin bidê te.

Dema Bêhestkirnê

Gelo wê êş hebe di dema di Bêhetkarîya taybetcihî de?

Ev ji kesekî heta kesek din diguhere. Dibe ku niqûçandin, zext an êş hebe, ku bi piranî kêmîtir ji deqeyek dom dike.

Çi dibe piştî ku Bêhetkarîya taybetcihî tê dayîn?

Çavê ku tê emeliyat kirin dê girtî bimîne da ku tiştê nekeve û zirarê nede rûyê çav. Dibe ku karmend çavê te masaj bikin, zextê bikin an giraniyek piçûk bidin ser çavê girtî da ku bibe alîkar ku Bêhestkirnê bi rengê wekhev belav bibe.

Ez çawa dizanim ku Bêhestkirnê baş dixebite?

bijîjkê Bêhestkirnê yan emeliyatkerê çav wê li çavê te venêrî da ku bizane ew benc kiriya. Dibe ku ji te werê xwestin ku tû li alî yê cuda binê da ku bandorên Bêhestkirnê binirxîne Gava ku ew kêfxweş in ku Bêhestkirnê baş dixebite, ew ê te derbasê nijdarîgehê kin.

Di nijdarîgehê de çi dibe?

- Dê çavdêrên dil û pêlê dîsa werin girêdan.
- Hemşîre dê fehs bike ku tû bi rehetî paldayî
- Tîma xebitandinê dê fehsek din bike da ku hûrguliyên te piştrast bike û ku bizane hemî alav rast in.
- Endamê karmend mimkine pêşniyar bike ku ew li seranserê emeliyatê destê te bigire.
- çarşefê emeliyatê ya stewr dê li ser rûyê te were danîn mîna konê ku dora çavê te paqij bimîne. Dê di çarşefê de qulek hebe da ku emîlkar dikare li ser çavê we bixebite.
- Dibe ku lûleyek di binê çarşefê emeliyatê de were danîn, ku dê hewa/oksîjenê paqij li dora dev û pozê te werê pif kirin. Ev ji te re dibe alîkar ku tû di dema emeliyatê de xwe rehet hîs bike.

Dê dora çavê te bi şilek sar were paqij kirin. Di dema emeliyatê de, av tê bikar anîn da ku çavê te şil bimîne. Tevî ku lênihêrî tê girtin ku ev av ji rûyê we nekeve xwarê, carinan zehmet e ku av jê ne wê dilopkirin

Gelo ez dikarim di dema emeliyatê de biaxivim?

Çêtir e ku tû nepeyive dema ku bijîjk çavê te emeliyat dike, heya ku bijîjk pirsek ji we neke. Veguheztina rûyê te dikare bandorê li ser neştergeriyê bike. Ger tû bixwaze tiştê bêje, çêtir e ku tû destê xwe bihejîne û bijîjkê çavê xwe xebatê rawestîne da ku tû biaxive.

Ez ê çi bibihîzim?

Tê bibihîz ku bijîjk di dema emeliyatê de bi tîma emeliyatê re diaxive. Amûrên di nijdarîgehê de dikarin dengên cihêreng derxînin. Dibe ku çavdêrê dil bike 'tûtût'. Hin makîneyan dengeê jinê bi kar fînin ku dem bi dem peyaman dixwîne. Ev ew e ku ji pizîşk re qala guhertinên di mîhengên de bike. Ger pizîşk bixwaze ku tû tiştê bike, mînak zeniya xwe hinekî hilde jor, ew ê bi navê te gazî bike. Ger navê te neyê gotin, ne hewce ye ku tû bersivê bide.

Gelo ezê tiştekek bibînim?

tû ê bi piranî bikaribe roniyên geş bibîne û dibe ku tû di dema emeliyatê de hin tevgerê bibîne. Ev ji kesekî heta kesek din diguhere. Tû nekare ti hûragahî bibîne û dibe tişt li ber çavê te ne zelal bin.

Wekî din wê çî bibe?

Pizişk bi amûrên hêja yê ku digihîje hundurê çavê te tevdigere - çavê te ji pozîsyona xweya normal nayê derxistin.

Gelo ezê di dema emeliyatê de êşê hîs bikim?

Tû hay jê hebe ku bijîjk dixebite û bi piranî dê hin têkilî û zextê hîs bike Lêbelê divê hûn êşek nekişînin. **Heke tû nerehefî an êşê hîs dike, divê tû bijîjkê xwe agahdar bike da ku heke pêwîst be ew dikare zêdetir Bêhestkirna taybetcihî bide te.**

Çî dibe ger ez çavê xwe bigerim?

Klîpek piçûk çavê te vekirî dihêle di emeliyatê de. Ev tê vê wateyê ku tû hîn jî dikare bi çavê xwe yê din bişkîne. Heya ku tû serê xwe nehejîne, ew normale ku tû çavê xwe bişkîne.

Çî dibe ku Heke ez bixwazim qirçim, kuxînim, qirika xwe paqij bikim an pozê xwe çikim?

Pêdivî ye ku tû bi xwe paldê bi awayekî rehetawayê. Pêdivî ye ku tû bijîşk hişyar bike û berî her tevgerê girîng (di nav de kuxik, xurîn an badan ji bo sererastkirina pozîsyona xwe) destê xwe bilind bike.. Dibe ku Pizişk di emeliyatê de raweste da ku tû bi silamefî cihê xwe biguhere.

Çî dibe heke ez di dema emeliyatê bi xew ve biçim?

Girîng e ku tû di dema emeliyatê de şiyar bimîne ji ber ku tevgera ji nişka ve dema ku tû ji xew şiyar dibe dikare zirarê bide çavê te. Pizişk wê her tim seh bike ku tû şiyarî û xweşhalî.. Ew ê di heman demê de te hişyar bike ger carinan hewce bike ku tû bi taybefî bê tevger be.

Mîzdaneke min lawaz e. Ger hewce bike ku ez biçim destavê?

Pêdivî ye ku tû mîzdana xwe vala bike berî ku te bînin nijdarîgehê. Di bûyera ku tû dilxwaziya çûyina destavxanê hîs dike û tû nikare xwe ragire, ji kerema xwe fîma emeliyatê agahdar bike ka kî dikare gavên pêwîst ji bo alîkariya te bavêje.

Ma ezê di nivê emeliyatê de êşê bikşînim?

Erê. Di hin proseduran de, dibe ku anesteziyê dest bi xilasbûnê bike. Ger tû di her kêliyê de acizbûn an êş hîs bike, divê tû bijîjk agahdar bike.

Emeliyat çiqas wext dixwe?

Piraniya proseduran di navbera nîv saet û saetekê de didomin. Hin proseduran mimkine du saet bidomin. pizişk wê texmînek bide te ka ew ê çiqas wext dibe..

Gelo ez dikarim di dema emeliyatê de semaha alîkariya bihîstinê bikar bînim?

Ev pratîk pir caran bikar tê ku meriv semaha alîkariya bihîstinê derxe ji aliyê ku çav li ser tê emeliyat kirin ji ber ku, heta ku tû li wan miqate be jî bi, av dibe ku têkeve guhê û dibe ku semaha alîkariya bihîstinê xera bibe û dangan derdixe. Tû dikare semaha alîkariya bihîstinê danê li milê ku neyê emeliyat kirin .

Pişî emeliyatê

Hemşîreyek wê te vegeîne beşê nexweşxaneyê bi kursiye kulekan. Dibe ku çavê te du -sê saetan bêhest bimîne, dibe ku zedetîrî wilo jî be.

Dibe ku çavê te bi pêçekê were pêçandin heya roja din , da ku wê biparêze û dema ku tû di xew de nehêle ku tû wê bixurîne. Gava ku pêça çavê tê rakirin, dibe ku tû dîfina ducaî tecrûbe bike heta çend saetan.

Kengî dikarim dest bi xwarin û vexwarinê bikim?

Tû dikare dest bi xwarin û vexwarinê bike gava ku tû gişî beşê nexweşxaneyê.

Gelo ez kengî dikarim vegeim malê?

Gava ku tû xwe baş hest dike û te tiştek xwarî û vexwarî be, di wê demê de tû dikare biçe malê.

Ger te dermanê hedarker kişandibe, divê mezinek berpirsiyar te bigire malê bi erebê an tekiyê. Pêdivî ye ku tû heta 24 saetan hay ji zarokan nebe û divê şîretên di belavoka jêrîn de bişopîne.

Agahiyên ji bo kesên ku lînêrîna kesekî ku Bêhetkarîya gişî an dermanê hedarker kişandibe têne dîtin di belavoka me ya bi nav lînêrîna kesekî ku Bêhetkarîya gişî an dermanê hedarker kişandibe ku li ser malpera me heye:

www.rcoa.ac.uk/patientinfo/sedation

Hemşîreya beşê wê li ser her dermanê ku tû hewce ne bikar bîne ji te re vebêje û talîmatên nivîskî bide te. Dibe ku dilopên çavan pişî emeliyatê bêne bikar anîn, da ku îlfîhaba (werimandin) kêmbike û bibe alîkar ku nehêle kulbûn kulbûn çêbibe. Ger hewce be ku tû vegeîne klînîkê bo fehsê, wê di derbarê vê yekê de ji te re werê gotin.

Ma ezê êşê bibinim?

Gava ku anesteziyê diqede belkî tû hin êşê ji emeliyatê hest pê bike. Dibe ku dermanek êşbir wekî paracetamol hewce be.

Heke tû êşê giran bikişîne, ji kerema xwe bi jimara ku li ser kaxezê hatî dayîn re têkilî bike ji ber ku ev ne normal e û dikare pirsgirêkek destnîşan bike.

Ma pêdivî ye ku ez lînêrînek taybetî bikar bînim?

- çavê xwe nexurîne.
- Çavên xwe biparêzin (nemaze di hewayaya bayê de) ku belkî tiştek bikeve çavê te de.
- Xwe demekî dûr be ji rakirina pir giran, werzîşa dijwar û avjenîkirinê, wekî ku tîma li te dinihêre şîret kirye.
- Ger dîfina te xirabtir bibe an çav pir êş bibe, divê tû yekser têkiliya nexweşxaneyê bike ji bo te şîret bikin.
- adesê çavan bikar neyn heta ku tû bi bijîjkê xwe re nîqaş neke.

Em gelek hewl didin da ku agahiya li vê namilkeyê durist lidar bixin û nûvejen bikin, lê em nikarin li vê ewlehî bikin. Em guman nakin ku ev agahîya gelemper bibe bersivên hemû pirsên we yê gengaz an jî bibe çareserîya her tiştên ji bo we girîng. Bi riya bikaranîna vê namilkeya ku wek pêşber, divê hûn bi fîma bijîjkî ra li ser bijarîyên û metirsîyên xwe bikevin niqaşê. Divê ev namilkeya xwe bi xwe wek şêwirek neyê bidesthilgirtin. Ev jî bo armancek bazarî an jî karî nayê bikaranîn. Ji bo redandina berpisriyariyê, ji kerema xwe ra li vir bitîkînin (www.rcoa.ac.uk/patient-information/translations/kurmanji).

Hemû wergeran jî alî wergervanên jî civaka Translators Without Borders (Wergervanên Bêsinor) tî çêkirin. Çawanîya van wergeran jî bo duristîya van heta jî dest tê tî venihartin, lê xetere heye ku hin agahîyan nedurist bin û çewt hatibin wergerandin.

Ji me re bêje nerîne te çi ye

Em pêşniyaran jî bo baştirkirina vê belavokê pêşwaz dikin.

Ger tîbînîyên te hene ku tû dixwaze bighîne me, ji kerema xwe jî wan bi e-mail bişîne li ser: patiinformation@rcoa.ac.uk

Royal College of Anesthetists

Churchill House, 35 Red Lion Square, London WC1R 4SG
020 7092 1500

www.rcoa.ac.uk

Çapa Pêncan, Sibat 2020

Ev belavok dê di nav sê salan de jî roja weşanê ve were nixandîn.

© 2020 Royal College of Anaesthetists

Dibe ku ev belavok bi armanca hilberîna materyalên agahdariya nexweş were kopî kirin. Ji kerema xwe vê çavkaniya eslî binvîse Heke tû dixwaze beşek vê belavokê di weşanek din de bikar bîne, divê spasnameyek guncan bê dayîn û logo, marqeb û wêne werin rakirin. Ji bo bêtir agahdariyê, ji kerema xwe bi me re têkilî bike.